Hevdem

Exlaq...!

Evîn Tahir Hirorî

Roj nabore û peyva exlaq û bêexlaqiyê nehê bihîstin. Erê ew çi tişte em bi exlaq bi nav dikin?

Ew bi xwe, her civakek li pey têgehên xwe pênaseyekê dide exlaqî, ango ji civakekê bo yek din li pey qûnaxa demî, ramana pênaseyê dihê guhorîn, bo nimûne: li hindek civakan exlaq bi babetên sêksî ve dihên girêdan, yan bi hezkirinê û helbijartina hevjîniyê ji layê keçê ve û dihê gotin ku filankes yê bê exlaqe û serberdayî ye ji ber ku hez ji felankesê dike. Li hindek civakan jî corê cilkî û şêweyê ji mal derketina xelkê exlaq e. Lê, di piraniya civakên sivîl de bêrêzî li beranber yasayê bi karek ne exlaqî dihê hejmartin û htd...!

Rojekê mamostayê me yê zankoyê, ku xwandina xwe li welatekê pêşketî bi dawî hînaye, basa ramana bêexlaqiyê li welatê ku jî hatî kir, ka çawan demê li destpêkê ew çûyî û hindek cîranên wî jê re gotin: Hişyar be têkiliya vê afreta cîrana me neke ji ber ku bêexlaqe!

Ew jî bi dirêjiya salekê silav li gel neda û nesitand, belê hindekê hêbetî mabû ji ber ku çi bêexlaq (helbet bi ramana civakê me) jê nedidît. Neşiya pitir bêhna xwe fireh bike û pirsyar ji wan cîranan kir û got: Ev salek e min çi bê exlaqî ji vê jinê nedîtiye, nexwe çima hûn weha dibêjîn?!

Bwersiva cîranan ev bû: Piştî şerê cihanî yê duyê, ku me welatê xwe yê wêran ava dikir,wê afretê pitir ji gulopekê hil dikir, ev e di demekê de ku xetê me hemûya kehreb nebû!

Xwezî em jî bi vî rengî li exlaqî têbigehin, ku tiştê bi kesayetî û azadiya me ve girêdayî neba pîvan bo exlaqî û bêexlaqiyê, belê belkî werar û berjewendiya civakî biba pîvan.